

Faruk ÎREMET

RONDIKÊ ÇAVÊN TÎ...

Kurmanjî - Dimilî



APEC

Faruk ÎREMET

RONDIKÊ ÇAVÊN TÎ ...

Kurmanjî - Dimilî

ISBN: 91-87730-27-8

APEC

Ev pirtûk bi alîkariya "Kulturrådet" ê ve hatiya çapkirin.
Denna bok är framställd med bidrag från Statens Kulturråd.

APEC

Faruk ÎREMET

RONDIKÊ ÇAVÊN TÎ ...

Kurmanjî - Dimilî

Weşanên APEC-TRYCK & FÖRLAG

ÇapaYekemîn: Çileyê paşin -1993

ISBN: 91-87730-27-8

**Utgivare: Apec-Tryck & Förlag
Box 3318, 163 03 Spånga/Sweden
Tel: 08-761 81 18, Fax: 08-761 24 90**

APEC

Artemîsê welatê mi

'Qandê may û way
ki janê xû visnay'

Senîn ez to vîra bikera ?
Maa ti, destanê mi ra aw nêsimit ?

Homa yê Afrodîtî nêbî,
zerya yê ma
kerdi germ ?
Agirê 'Harîman' bî ç imanê mi di
û ti, dest xû day ser
û ç imanê xû yê delal
bewna....

û ay ç iman di roj werya.

No ç end serî yo ma ehlak ra
qanûn peyda kerdi,
no ç end serî yo mûyê ma rijya yo ?
No ç end serî yo ma ç ina dayo xû ra ?
No ç end serî yo 'hoday' xû peyda kerdi ?
Ka homa 'homo sapiens' ?

Ez a....

Ez a homa yê erdî.

Ez a homo sapiens.

û ez bîya, mi Hêwa peyda kerd.

Adem bî, qeç ê homa yê girdî.

û Hêwa yê ma, êy xapêyna.

Homa yê girdî,

lacê xû,

key xû ra est...

Ti destanê mi ra aw şimit
û mi adirê to, bi ç imanê xu ya wişk kerd,
şîrzanê (olanê) ma bî, bi va yê Aiolos
wûnî ma veynda hezar serî ra -tîya-
şîrzanê vengi dîrokê (tarîx) ma bî,
dîrokê hez kerdên a ma bî.

Maa ez nêbiya to kerdê Hera yê xu
û Hera,
o yo ca yê xu gîno,
û vengey a zerya yê mi di, o ç i hawar bî...
Ti kotî di ra ?

Ti welatê mino şîrîn di,
-xu nêvisna-
o yo welatê ma di zî
peyda beno
Artemîs î...

Ç i delal a Artemîsê welatê mi
û ç i xurtî yê, wûnî zivistani di
adir vilikî akeno
leşê înan di.

Homa: Elah, Xuda

Hera: Homa ya gird, maya homa yani

Artemîs: Mîtoloji yê Yûnanî di homa yê Seyîd bî

Afrodîtî: Mîtoloji yê Yûnanî di homa yê hezkerdenî bî

Harîman(Ahrîman): Diyanetê Zerdeştî di homa yê adirî

Homo Sapiens: Ziwanê latîni di Însanê vernî

Aiolos: Mîtoloji yê Yûnanî di homa yê vay.

Û Ş Î Î Î ...

Kam bî, virarê mi di.
Kam bî, bermayen a xû di,
o kam bî, mi hezkerd,
û nêbewna paştî yê xû
şî...

Mi ra dûrî nêbî,
tersanê ç imên to,
mi, to ra jew gamî,
dûrî di bî ya
û ti,
ç imên to yên tersan,
hêrsî barî kerdê,
û mi nêvînay...

Porê to,
destan dê mi ra...
zeydê aw'a xîj bî
waştênî mi va, beno-
tepiştênî -vinî bî cayê di-
dîma *ganê mi...
zerya mi rê adir kewt.

Ez, bê to.
Û ti, nêbewna paştî yê xû...
û ş î î î...

*gotî di ro niqa
hersanê çimê mi
beno kî ti,
cayê di nimnay
bêsûal,*

bêperskerdeni,

*gulê mi,
gulanê zimistanî
** bonê to, axxx...
Bêvengey bîyo, dêrê zerecan
Hesretey a mi, qandê to...
heşan di, beno muzîq...*

** gan - jan, can*

*** bon - bîfn*

Ariqê ma

*Ez nêşena abirna pê ra
şan û roj
û nêwazena vîni bikêra
cayê di
bê veng
bewnayîşê ç iman.*

*Jew qedyayeni di
ma xû vînay
paşti ya heme ç î di
germeya hezkerdeni est bî.
Hezkerdeni qandê dûrî,
qandê nezdi
qandê to...
Ti, lewanê min o ser di,
dansê folklorî ke.*

*destê ma pêra hendi dûrî nêbî
germey a roji
ariqê ma ser bî,
beno ki,
ç î yê weş biro vîra kerdeni,
la, ma nêşenê vîra bikêrê
serdi
ma
senî
peyda kerd
germey,*

û ariqê ma,
zeydê raman ê ma
nezdî yê sinor bî

ma, nezdî yê pê bî
ma, virnayîşê şanî bî,
ma, maç kerdên a germey a lewan bî
ma, şermayey keynekan bî
ma, qaç axê germeyda hezkerdeni
û ma zîwanê xû,
qaç ax ard kar
û ma eyê, êy nêmerdî...

Virnayiş û Werzayen

Qedyayen a jîyan nî yo
wûşk bîyayen a
nan a destê mi.

Hersê ç imê mi,
şeno hû bikero
heme wûşkey a,
qehrêy a,
veysaney a pîze yê
bêhewêr.

Va dano porê mi
-porê mi yeno virnayîşi-
û yeno virnayîşi
-ç are yê mi-
û ç are yê mi
zey dê gol a Wan.

Wan, bê aw
-wûşk û palax bîyo-
ray dano adir a Kela Dimdim rê.

Weysaney a,
teysaney a,
harî ya, zerya di kulin,
nîno anceyeni,

lo tenya vera di,
ez wazena,
werza ser saqeyê xû
ma werzê ser saqeyê xû
ger nêviryo bi va di
werzayenê mi,
û werzayen a şima.

Labirê, qedyayen a zilim
-qedyayen,-

lo tenya merg a yeno

qandê hêrsî,
no kelîme, ziwanê ma di zî esto.
Hêrsî û wişkey a ç imê ma bêwehêr
vernî di va
welat ra welat
koç keno.

Ma estê,
û ma koç ti zî nêmirênê,
koç û sirgûn. adir a ma yê -HARŞ- di mîren o
Qedyayen a dinya nî yo
wûşk bîya yen a

gulî di destê mi
beno kî gul bimîro, û bîro kîştên.
Lo kanî ya ci,
lo darê ci,
kokê ci axtir o, û nêmirêno
û ma zî
wûnî ax ti
cay giroto
û ma nînê, cîkerdenî.

Ma yê, aw a goli Wan,
ma yê, adirê kela Dimdim
ma yê, veysaney a pîze yê bêhewêr
û ma, şenê vîna zî bîhiwê. (kenvan).....

Nimite bî

Tari yê nîme yê şewi di
şewqi kardîy a tûji ser gûnî bî
û qêyrayiş a ay bî
ay kamî bî ?
a kî kîşya
û bedenê xû ciwanî visnay.

Halûnî bê mirîç ikî mend
kêye bê qeç ek,
û qeç ekî bê pi
bê may mend
qijînnnnn.....
no sûr bî, ka sipe
jîyan xû mîyan haqan di nimna bî,
qererê fermanê kîştênî ina vicya
û ê daran di kamî yeno darkerdîş
ay kamî - bî ?
kî, bî vilikî daran.

Jew nêbî,
hîrê nêbî,
des nêbî,
hezaran amey kîştênî
wêhêrê ino erdan...

Tarî yê nîme şewî di
vengê qeç ekan bî
zey xortan
û serhîldan arê kerdê
pê zere yê xû tenik
kotî di ro rewşenbîrê

ino welati
azadî bê veng mendo...

Hîrsê ç imanê qeç ekan,
adirê bedenê kêynekan,
hawarê may û pî
rizgar bikero berîyê asin ra
sere kewte, mîlo şikyaye,
welatê ma ...

Bilbilo

*Lo bilbilo...
bilbilê mi,
bilbilê dara ma ya wişki
ti zey bilbilê wextê kergan
zere yê to,
wûnî tam giroto zilimra
biyo zeydê wexto bêwext
û o bê wext,
fina ti,
zeydê mûmûya
şewq danê.*

*Ez, to ç arnena,
ez nê vînena
kamcîn kuç e ê min
û kamcîn dar ê to ya.*

*Înan ma rê vanê...
-Şima adir di rê
şima ray nêvinene
lo ç iya nêbeno
wa zeydê înan bo.*

*Lo bilbilo,
bilbilê keydê ma
fina vengê wîni dûrîra
ti,
qefesdê xwe ra
fina,
mi,
nêvînenê*

*ez, to vînena
sersî ya to
wîni şewq dawo zey mûm a.*

*Zeydê keymekê
daro akerde
û ti destê ey di
veng danê
tirbi da
jew gencî di
zey gul a wûşk bîyo
vengê to,
zere dê mi di.
Ez xo nêvînena
vîra meki ê gencan
ez xo ra pers kena
ez kotî di ra*

Aya bîyaye

Wext - bêvengo -
ti - dîrî di ra -
zeydê ramandê min a
- dîrî kewteni -

Ray - zaf dîrî ya -
ez - aya bîyaye yê tarî ya -
zeydê aw û rojî ya
- û ma tim vanenê -

Dil (zerî) - pak o-
şima - weş sinasnenê şanî
zûrî her tim xo nimneno-
qey heme zanê
- hezkerdeni dizey (xîrxîzey) a
nîyo
hezkerdeni, zey jew ristîya
weşey û tewmayîşo-

Jiyan -ax... ç i zahmet o-
weşey -merdiman xo vîra kerdo-
xîrabey -ax... heme zanê-
zeman (dem) -yena virnayîş-
ma jî winî kenê
- qandê ç î destî heme jew nîyê-

Hînsanî (însanî) hîn benê, zanê
- labrê hînsanî jî winî kenê-
û hezkerdeni, -qezenç kenê-
Ax... bêhêşeyyy, ç i weşî bî
- hersê ç imandê to-

Varan -winî weş, zey pemîya
to vilêneno-
adir ra -sersîya to virazîya ya-
û ez -ê lewanê to vê german
vilênena û maç kena
ê varanî bin di.-
û ti -destandê mi bindi, xo ya şîya-
destê ma destandê pê ser o
ç i weş beno,
wirna destî jew beno.
û ç i weş beno,
jew bîyaye ya zerî ya kulin...

Qucixê to yê riwenin

Îna vanê şîrê tiya ra
wûnî nêbeno
merdim nêşeno şîro
wûnî lej nêqedêno
wûnî ray nêqedêno

Enbazê mi vaci maya mi rê
wûnî nêbermo
hersê xû nêverdo
wûnî hirsî nêqedêno
wûnî hesret nêqedêno

Tiyana wûnî serd o, pîyê mi
kotî di ro nika qucixê to yê
riwenin

tîya di vewr esto
tîya di vergî estê.

Bra yê mi ti nika kotî di rê
ez nika êima ra wûnî dûrî di ra
vacî ey rê
Farûk to hez keno
û vîra nêkerdo

Enbazê mi,
ma wûncara amey
wûnî nêbeno
wûnî lej nêqedêno
wûnî ray nêqedêno
qe ç î yê wûnî

- vîra nêşino-
û ray,
nêqedêno....

Sewregi

Sûkî...

Sûka ma Sewregi.

Ç end ganî to ser o qûrban bî,
nika ti destandê kê di ra..

To ver,

ez,

nika gûnî (gonî) virejêna .

Rextê mi nika vengo,

mahkûmî heme ray di rê.

Berd talan û kerd vêran,

welatê min o şîrin.

Zeydê rizwendê kelî

roteyê ma,

gûnîda şoreşgeran ser a şî.

Kotî di mend,

ray birnays,

vîla biyayîş,

kîstena xortan...

Kîsta destandê rotandê ma ra.

*Sûki,
sûka mi Sewregi,
ez qeç ê to,
nika tîya di,
teniya,
fikirê mi,
wija di,
to hieti.
Enbazan ra,
may û birayan ra dûrî,
bê sûkda xo, xerîbey di.
Sûki,
Sewrega mi
enbazeya xo mi rê birişi.*

*Wa bimirê rotey
û ê kî to roênê
û roştê dişmenan.
Vengê min o yeno to?
No veng xerîbey,
û tenyayey ra yeno,
no vengê hesretey,
û zerî da kulîno.*

No qeder nîyo

Enbaz o,
birayê mi.
Şima wûtara (tîyara) şî,
no ç end serî yo,
kes niyame tîyanan.

Enbaz o,
tîyanan di heme ç î,
wişk û palax bî .
teyr û tûrî halînî nêviraştî
hakî nêkerdî û leyri nêvetî,
gulanê wesarî nîyakerd
û gulî nêday.

Birayê mi,
wirna ç imê mi.
Ez to rê se vaca.
No ç end serî yo
zerê ma gûnî virit
û pêzedê ma kulî peyda bî.

Ez to rê ç iç î ra bahs bikera?
Heme ç î winî kewt tê mîyan
û ç ewt şî kî.
Bahs kerdene hebê zehmeto.
Tiya di heme ç î esto,
Derd û kulî kewt tê mîyan.

Ma cor di va,
tîyanan di gulî niyabiyay
wişk bi.
Ez bawera,
wîjanan di gul û vilikî abiyaye
heme ca bêyo gul û gulîstan.
Hesretey a nêdiyayenda înan
derd û kulî ma di pey da kerdi.
Ma no yo, no qeder o.

Zerare ma keşt rê ç inê bi.
keşt rê ç inê bi...
Bî se, zera rê înan ma rê bi.
Adir bikewo înan,
û keydê înan.

Adir,
adir o winî sîr,
qesibada înan kewo.
Adir kewt a qesibada ma.
wa ê înan jî kewo.

Embaz o,
birayê mi,
ç imê mi...
destê to weşî bê,
destê to....
Gulî danê destandê mi,
û dirbetanê mi kenê weşî.

*Nika,
ç iman ser...*

*Ma rojë pë vinenë,
rojë,
mi rë,
to rë,
ma rë,
şima rë.*

*Qandë heme insanan
jew roj,
rojë ma...
O yo ray ser o yo,
o yo yeno.
Qandë ma,
rojë weşî.*

Camerdey

*Ç imî akerde
dest veng
zeriya ma di
ma fina camêrdî yê.*

*Awa rijiyêna cor a
ma ca nêvînenê
adir, zeydê gûnî ya ç erx beno
ç imê ma winî ray birmeno
ma kotî di rê
şima kotî di rê
ti,
heyatê înan ra jew parç e
ti,
ez to vîr a nêkena
ez to vir a nêkena
û hersanê ç imandê to.*

*Ç imî akerde
ti, zey gulda şefaqî
wûnî akerde
ç imandê mi di.*

Ez,
hesretê to
û hesretê eşqê to
ez to ra jew parç e
to hetî,
wûca di,
erdê to di
ti ramandê mi di rê.

Ez bi hesretey da

to ya

lej kena

ez heskerdenda

to ya

şa bena

Tî,
heyalê mi di
hergi roj,
zeydê gulda şefaqî ya
akerde
Sewrega mi.

Ma qeç ekê to,
to ra jew parç e
fina a camerdey ma di
û rihdê ma di na camerdey
qandê to û hesretey da to...

Adir

*Şima,
zerî şima,
winî tehm giroto
 zilim ra
kuli biyê.
Biyo zeydê şewda
 tarî ya
û şima xo,
vini nêkerdo
 û mîl nê ronayo
adirî miyan di
 embazê mi.*

Wija Di

May a mi,
kulê zerî da mi
nika hesretey ra zahf gird bîyo
senîn,
nêzana
senî berza
zerî da xo ra hêşî (kulî)
serê mi bî vîst û ç ihar
ez vana qey
ez bîya kal
axir,
sipe nêkewto pordê mi
labrê mêjê mi
heyna winî genco
zeydê gencey da min'a.

Wardê mi;
nêzana to rê senî vaja
heyatê mi
nêzana
kotî di qedêno.
Birayê mi,
way a mi, enbazê mi,
şima ney rind bizanê
vîr a nêkena,
heskerdeni û germey
wija di ra
wardê may û pî
dost û enbazî di ra....

Peyda kerd

Ax... Dinya
erdê to
koy û kerey to
deşt û xoşanê to
dar û berê to
sî û awê to
heme, heme ç îyê to
mira dûrî
nezdî yê to
ti bi xu
xo nêvînenê
zeydê serxoşan a doşbenê,
ç orşmandê xo di
ç orşmandê rojî di
ti zeydê berdûşan a
bê ç ina akerde
akerde....
şewandê tariyand di
vengave ya azmîni di
vinî bîyê
ez to,
hêşandê xo ra,
ez to,
hêrsê ç imandê xo ra,
ez to,
destandê xo ra...
peyda kena
zey resman a.
Ax... Dinya...

Winî çî esto kî...

*ew name mi rê birîşi,
ez zahf dûrî di ra .
Ju silami bidî mi,
ez a hesretey di ra.
Kam şeno ç îyê vajo,
no heme destê înan ra,
ma nîyame, ma sere di.*

*Ez nêwazena,
ç imê mi akerdey şirê.
Ez wazena fina şima,
û wijanan bivîna.*

*Birayê mi,
mî rê ç îyê mevajê,
qe ç îyê veng nîyo.
Heme ç î qandê armançî yo.
Winî ç î estê...
Merdim nêşeno xo vîra bikera.
Zeydê zerê û qesibaya yo.
Zeydê eşqê Memê Alan'î ya yo.*

*Ma dûrî di rê,
o ç î heqê ma nêbî.
Înan waşt ma vinî kerê,
labrê ma vinî nêbenê.*

*Fina ray abiyay ma rê,
newe ra ma xo verdê ray ser.
Fina maya ma,
welat,
adîrî mîyan di ro...î*

Kî naxwaze!

*Ey îşkence !
zîlma jana min
derîyê hesin her dem girtî
dîlopê xwin
li ser diranên min ên şikestî
birîndar e- biranînên min.-*

*Li destê NEWTON elektrîk geş bû
û bû ronîya şevên girtî.
Fedî nema,
û mêranî bû perç e - perç e
lê belê xwestin nehat şikestin.*

*Heval û hogirên min,
hûn li ber ç avên min,
wek roja havînê, direj...
Wek melodîyeke xweş,
di nav guhê min de olan in.*

*Ax... Ew tama xwînê,
li ser lêvên te bûn.
Lêvên te kîrin perç e - perç e
û xwîna te,
li pey derîyên hesinî ên girtî
û di nav lepên xwînaxwaran de.*

*Kî naxwaze bijî jiyanê
û salên xwe yên ciwaniyê
kî naxwaze, kî naxwazeee...
her ç end girtî be jî jiyan-
her dixwaze bijî.*

Qîrîna te

Xweşikê,
ez mîvanê te me
nivîn ê raçe
bi destên xwe.

Dixwazim xe naskim
ji bêhna te.

Wek barana şevê,
me xwe veşarti bû,
li bin....
û lêvên ti
wek axa qelîşî...

Tev li wê hejarîyê,
dîlê te wek pola
hêsirên te wek agir
mi şewitand.

Çiya bû wek şîna zaroka
li ser milê mi
- Tu -
êşa te
û hêsirên ç avên te
kortika tijekir.

Ax xweşîkê,
ax delala mi,
tu êşa ç avê minê yekem
bêhna te hêsirê ç avan min
tu li bîr minî
li bin agir.

Qîrîna te,
wek tî bûna
gola Wanê
ez pelê darê me
ji dara xwe ketim
- payîzê -
ber bayê
hişk,

li bin şeva baranê
mi te dît
û min xem kişand
û gihastina te
xwîna min germ kir
di hundirê min de...

Di himbêza te de,
dengê pêlên avê,
û darên hişk
ez hîn bûm
hêsirên
ç avê xwe
kom bi kim
ji bo wê hesretê....

Volqanê vemirî

*Ew evînê ji bo te, dide min
ew bîrî kirinên hêz,
kengê Dîjle, diherike ji jor ve
û xêz diki sinora, li gel ve Firat.*

*Evîna mi, tê bîra te
em bi hev re ç ûn Pira - dehç av
û em mêze kirin jêr, li ava Dîjlê
raman di kir ser bextê xwe.*

*Me zarok xwestin, yek malbat
bextê me, em bêgav kirin û dûrxistin
em diç in dora birca Amedê
mîna xelekekê xwe birin
û li vê derê, ez nabînim
talîya wê û nê jî destpêkirina wê.*

*Ew xweşhevîdarîa me xwest, ji bo xwe
nuha bû sîdar (sîh)
hertîşt dikare xwe bugherîne
bilî avîra Kurdistan.*

*Wa dîsa rojek derbas bû
ji bo me dîsa rûpel ma liser
binivîsînîn*

*ew roja ku ç û
Harî di xwed anî
kînga ew harî xwe biguherîne bi evînê
kulîlka zeytûnê xwe vedike ser ç îyayê me
ew roj, tav xwe vedike li ser welatê me.*

*Ew evîn ji bo te Nazê
xwestina me ji bo te azadî, bê tirs
volqanên vemirîn li Ç iyayê - Pezêkovî (Qerejdax)
di peqe agirê wan li hundirê min...*

*Min jî bîra meke
ez jî bîra nakim
darên me yên tuwa
dibe ku zuhabûn
lê belê, kewan nebirîn
qebqeba xwe li zinarên te....*

Narîn

'Narîné
lê narîné'
ç awreşê
bindestê
birîndar bû
ji bo te xortê şêr
ew gula sore ku
te da
hişk nebû
di destê şoreşker de.

Narîné
can narîné
kerengê Qerejdaxê
henara Qetîné
tirîya Sûkê
petixê Diyarbekirê
li dilê xortan de
guae ko nahîşkî

narîné
hawar narîné
sev ç iqas bêdawî û tarî ye
û nikare wînda bike
evîna me

Ji axîna te,
dijmîn hat şikandin.
ew axîna te ku,
ji bo şoreşker.
û ew gula sora ku
te da
hişk nebû,
di destê şoreşkeran de...

Bê te

*Heviya min
bîr hatina min,
bê te,
ez ,
bindestim .
Ez,
kole me.*

*Tu...
dermanê hêş a min.
Tu...
Sewqa rondik a ç avê min.
Tu...
germîya
evîna dilê min ê yekemîn.
Bê te,
û bê navê te,
ez,
kole me.*

*Dibe ku,
ez...
Murekebê pênivîsê te.
Dibe ku,
ez...
Hevoka a ferhenga te.
Dibe ku,
ez...
Dilopekî ji xwîna te.
Dibe ku,
ez...
Tirsîna bê tirsim.
Ez im,
ez im,
axîna te.
Ez im,
ez im,
tev êşa te.
Ez im,
birîndar...*

*Tu hêvîya min,
her paşîya evîndarî
tu,
germîya leşê min...*

Rondikê çavên min ên tî

Mi eşandin,
mi bernedan,
mi hesret barand
 ji bo behna te
bernedan bikenim
 rondikên ç avên min ên tî
 bêze dikin dijî wan...
bawer nekirin, ez biwêrim
ji bo min, te qedexe kirin
û mi,
nav li te kir
ji bo me dozek bû
û sermilê min zarokên berşîr,
tu bihara min
behna te ç i xweş e ... dayê.

Dem,
û hertişt,
li gel te man,
megrî,
megrî...
rondikên ç avên te, gazî min dikin.
dûrim dayê,
dûrim...
bibe û roj nebînim
 di hundirê agir de, dişewitim,
û hevalên min,
min tenê bernedan.

*Dilê me bêzingar e,
evîn,
wek bêhna te ye
û bêhna axê li berbangê,
û dinivisînim, tu kê ye?...
Ez gundî me...*

*Bikene,
naz meke,
dilê min hezar perç e bû
di nav wan de tu,
brindar...
Û di sînga te de kêrên tûj,
ax ...welato...*

Gundê me

Ez gundî me
li zikê bajerê mezinan
bavê min
 karkerekî bû
dîya min dîya pênc zarokan
pênc xemekî mezin
û pênc sedsal
bindestê dijmin

Heran
ç olekî bê - baran
navenda
Dijle û Firat
li başûrê wî Xabûr
û roja bakurê
 li berbang ser ava kehnî

dilê keç ên ciwanan
dilê hortên ciwanan
li vir, li gundê me
li dijî dijmin
bavê me welat.
dîya me Dijle û Firat
bi ducan bû
20 û lawikên spehî ani dinê

*ez gundî me
gundîyê
gotinê
Yılmaz Guney'im
li Qerejdaxê
li ber ava kahniyê
li Heranê
li burcê Diyarbekir'ê
xortê ciwan im.*

*wellato,
min ramûsa
axa te
ji bo evîna xweşî
tev zarok
evîn peyda kir
li govendê...*

Peyîk

*Kalekî,
ser ç okê xwe rûniştî
tutûnê qaç axî
ser peyîkê wî
cixare dipeç i
qermiş ê rûyê wî
qermiş ê hêşa
qermiş ê hesret
û qermiş ê sedsalan
ew hêş dîyar e
ser qermiş ê wî.*

Peyakî

*Dermana jana min î
dilê min î
peyda dike xweşî
ewîna min î.*

*tebî î
ew hatin,
û ç ûn.
kendala bilind ke
li destê te
nêrgîza spi
nezîka te bim*

*newalan
ji cîhê xwe radikin
penaber dikin jiyar
gul, gulbihar
li berbangê
destê pîrejina bi ser ket*

*mîna her timî
ç ek
ji nişkê ve
pêşî
xwîn dirijîne*

peyakî
destê wî
ser simbêlê wî
lê jî bîr dîke

dibe ku
ez bêhevî
meqehrî
bi rêk û pêk
em tev hatin.

dermanê canê min î
evîna min î
li hundirê newalan
li ser ç îyan
li hundirê berfan
nergiza min î

destê pîre
av dirijî
û tu tî yî
av cîh nedît
û ew xweşî
ji ç avê te revî.

Insanê mezin

'Ji bo bavê min'

Can, min nakşîne
ruh min nakşîne
her roj, xeberekê tê
dest naç e
dîl naç e
û
ez nikarim biç im
xwîn nayê ji dilê min
lê ez birîndar im
heşê min azad nîne
xeberek tê
dilê min ne hazir e

wer meke
dîl meke
ez nikarim biç im
dûr e,
ji bo min zehmet e
azadî hêvî ye
hêvî, xweşhêvîdarî ye
xweşhêvîdarî welat e
ew ji niha dûr e

ba li rûyê min dide
sar e
û baran
şil im
dilê min diç e,
dixwazim maç bikim axa te
û bîhn bikim
ew ji niha dûr e

bavo,
jiyan zehmet e
derew û xayîn e
hezlar car dibêjim,
ji te hez dikim
dengê min nayê te
dixwazim werim
axa li ser te
maç bikim
bîhn bikim
ew ji niha dûr e
û he li dilê min
û barwer bike
ez te ji bîr nakim
însanê mezin û karker...

Bîhna wî

Agirê sor
hesin,
germ û dijwar dike
dijwar dike dilê min
dijwar dike av
dijwar dike wek tûjê kêran

agirê cixarê
û bîhna wî
dûr
û nezîkê min
tûkelê wî
mîna dijîlê
 hundirê newalan
sekilê te
ji bo min
 xêz dike
û
ç avê tazî
xweşiyên wî me
 Hovîya wî

Gul û roj

Tu bi xêr hatî
derd û ezep
kul û mirin
can û can
hevî te,
kanî ez bêjim
kanî ez bêjim
tu tamaşe bikî
çiqas xweş roj
tu bi xêr hatî
roj bi roj,
lî hundirê te
ez zanim heval
çî şer dibe...
destê te ye hesin
şerê te ye mezin
werin tamaşe bikin hevalno
hesinkar rê vedike
bijît
bijît heval tu bixêr hatî
tu, peşmergeyekî, karker î
tu, roj bi roj di nav şeran de
mezin bûyî
lî dilê te tirs tune
ez zanim
şoresker î, peşmerge yî
ez lî te, destê te û ç epan
nas dikim

*bi xêr be, bixêr be,
tu bi xêr hati hevalo...
hesreta dê û bav
gul û aşiqê
hevî û roj
hesreta te,
derd û ezep,
kul û mirin
can û can,
rê vedikin hesinkêr
werin tamaşe bikin hevalno.*

Gula min

Ç axa gulê, tu tê bîra min
ç axa gulê, heval ê min tê bîra min
ez zanim li welatê min
şer heye
li canê ç avreşa min
gulsora min
pewîst e tu bizanî ev şer
nuh nîne
kalê me, pîrê me
di van rîyan de ç ûne
niha tê bîra min
di xezar û nehsid û xeystê de
ç awa şoreşkerên me hatin kûştin
ç awa şoreşkerên me şer kirin
gel meji hundrê xûnî bû
gula min, ç avreşa min
gula sora min
te di nama xwede nivisandîye
tu dibejî 'we em tenê berdane'
ez zanim wek me jî nabe
lê gulê, ç avreşa min
gula sora min
berê hesretê em tenê berdane
niha jî derdê me
ew, her dem serê me dixwe.

Jinên Kurdistanê

Li destê minê ç ep alaya sor
li destê minê rast ç ekê min
li riya Kurdistanê şerê min
riya karker û xebatkaran
li serê ç iyan, di destê wê de ç ekê wê
jinên Kurdistanê
xebatkar im xebatkar im xwişka min
dîya min û bavê min, ez şandim
ez şandim ser riya şoreşê
jina min destçeka min
xebatkara min
hevala min
tu jî, wekî min, hati kûşt in
li te jî ezîyet kirin
tu jî surgûn kirin welatekî dûr
destê xwe bide destê min
jina min...
şoreşkêra Kurdistanê.

Dijmin nebîne

Saêt dozde
şev
û
tarî
cixarekî pêxîne
agirîcixare
rê nîşan bide
û şîar be
dijmin nebîne

Dîrok ji bo me
hundirê yek deqe
ç ar parçe ye
mêjî peşmerge welat e kî

ez li bakûrê
hevalê min Salah
li başûrê
gotina me wekhev e
û ez tirkî helbesta dinivisînim
heval Mehemed xelkê Amûde
û erebî dinivisîne
ew hevalên din nas nakim
xelkê rojhîlatê
me
tev
ç ar cixare pexistin
li yek agirî
mêjî peşmerge
bû agirî КАВА

mirovekî
tenê
rûniştîye li ber pêlê
av ser pê ê wî
û ew ser li kursî
 rûniştîye
û kursîya wî bû
xeyala e wî
wek şûşekî şikestî
dilê wî şikestî
serê wî
serç oka wî
şevreşî
bextreşî
bavê...
nemîne
ew tengasî dilê te
mirovekî tenê
rûniştî ber pêlê
û ew şevreşî
ez im ...

Birçî

*Ez,
spî yê şevên tarî yên
zivistanê.*

*Tu,
hîva havînê.*

*Ez,
bê sînor,
şevên hîva te.*

*Tu,
ava ç olê,
germî ya havînê,
û tî hembêza te,
wek zarokêk bê şîr
birç î....*




Foto: Kristina Folgert

Faruk Îremet, 1965, ji Kurdistana Bakûrê, bajarê Siwêrekê (Kela Svêdan) ye. Wî di gelek weşanên kurdî, swedî û tirkî de nivîs û helbestên xwe çap kiriye. Di sala 1985'an de xeleta kovara "Yeşil Yürüyüş" ê girtiye.

ISBN: 91- 87730-27-8